FUNDAMENTAL RIGHTS
RIGHTS DEFENDERS
FAIR TRIAL

# Di du hefteyên dawîn de li Tirkiyeyê…

### 16ê Tîrmehê, 2022

### Li Orduyê du bijîşk ji ber parvekirinên xwe yên Twitterê bi awayekî demkî ji kar hatin bidûrxistin

Bijîşkê pratîsyen U.G. ku li Nexweşxaneya Dewletê ya Gurgentepeyê kar dike bi îdîaya ku di parvekirinên xwe yên li ser medyaya civakî de heqaret li gel kiriye û bijîşka pratisyen S.Ö. ku li Nexweşxaneya Dewletê ya Golkoyê kar dike jî bi îdiaya ku li bin vê parvekirinê şîroveyên rengheqaret kirine bi awayekî demkî ji karê xwe hatin bidûrxistin.

Der barê her du bijîşkan de lêpirsîna îdarî hat destpêkirin. Ji Wezareta Tenduristiyê jî mufetîş hat xwestin.

Di parvekirina navborî de, bijîjk U.G. der barê hîjyena nexweşan de şîroveyên neyînî kirine. Bijîşka ku bersiva vê şîroveyê daye jî li ser hewcedariya serşokê şîrove kiriye.

### 17ê Tîrmehê, 2022

### Walîtîya Giresunê konsera Apolas Lermî qedexe kir

Konsera hunermendê ji Deryaya Reş Abdurrahman Lermi ku bi navê Apolas Lermî tê nasîn, ji aliyê walîtiyê ve hat betalkirin. Konser dê li navçeya Guceyê ya bi ser Giresunê ve ye di "Şahîneya Ağaçbaşı Otçu"yê de pêk bihata. Ev konsera çaremîn a Apolas Lermî ye ku ji 19ê Gulanê vir ve hatiye betalkirin.

Piştî ku Apolas Lermî di çalakiya ku ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê ve ji bo 19'ê Gulanê Cejna Ciwan û Sporê hat lidarxistin de derket ser dikê, Serokê Partiya Serkeftinê Ûmît Ozdag û çapemeniya nêzî hikûmetê ew wekî hedef nişan da. Hat îdiakirin ku Lermî li ber ala Pontusê stran gotiye û 19ê Gulana 1919an wekî roja qirkirinê qebûl kiriye.

Piştî van nûçeyên ku di çapemeniyê de cih girtin konsera hunermendî ku dê di 29'ê Gulana 2022'an de li Denîzliyê bihata lidarxistin, konsera Bostanciyê ku dê di 11'ê Hezîrana 2022'an de pêk bihata û ya 33emîn Festîvala Kadîrgayê ya Deşta Acelleyê hatin betalkirin.

### 19ê Tîrmehê, 2022

### Şûraya Dewletê daxwaza betalkirina Peymana Stenbolê red kir.

Lijneya 10emîn a Şûraya Dewletê daxwaza betalkirina biryara Serokomariyê ya vekişîna ji Peymana Stenbolê ya 20ê Adara 2021an red kir. Biryar, li gel du dengên neyînî bi sê dengan hat girtin.

Peymana ku di dema Serokatiya Tirkiyê ya Konseya Ewropayê de li Stenbolê ji bo îmzekirinê hat vekirin, weke "Peymana Stenbolê" tê nasîn.

Ji bo betalkirina biryara vekişîna Peymana Konseya Ewropayê ya li ser pêşîlêgirtin û têkoşîna li dijî şîdeta li ser jinan û şîdeta nav malê gelek doz li Şûraya Dewletê hatin vekirin. Şûraya Dewletê di dozên ku

hatin vekirin de daxwazên ji bo rawestandina înfazê red kir û daxwazên betalkirinê bi danişînan nirxandin. Peymana Stenbolê di sala 2011'an de ji bo îmzekirinê hatibû vekirin û Tirkiye welatê yekemîn bû ku peyman erê kir.

Biryara Serokomariyê ya der barê betalkirinê de li gorî bendên peymanê 3 meh piştî ku ji Komîsyona Ewropayê re hat ragihandin ket meriyetê û Tirkiye bi awayekî fermî ji peymanê derket.

Hinceta betalkirina peymanê ew bû ku biryareke ku ji alîyê parlementoyê ve hatibû girtin, bi biryarnameya serokomariyê hatibû xerakirin û ev yek li dijî pîvanên qanûnî bû.

### Li Mihrîcana Minzûrê, konserên Grup Yorum û Grup Isyan Ateşi hatin qedexekirin

Walîtiya Tunceliyê di 20emîn Festîvala Çand û Xwezayê ya Minzûrê de konserên Grup Yorum û Grup Isyan Ateşi qedexe kir. Herdu koman li ser hesabên xwe yên fermî yên twitterê ev qedexe ragihandin.

Mihrîcana Minzûrê di salên 2020 û 2021'an de ji ber şewba Covîd-19ê ji neçarî hatibû taloqkirin. Dirûşma mihrîcanê îsal wekî "Em li dijî madenvanîyê xwezayê, li dijî talanê jiyanê, li dijî qedexeyan hunerê diparêzin" hatibû destnîşankirin.

Festîvala ku dê di 21ê tîrmeha 2022an de bihata lidarxistin ji ber biryarên qedexeyê yên Walîtiya Tunceliyê ji aliyê komîteya amadekar ve hat betalkirin. Komîteyê ragihand ku ketina bajêr ji ber lêgerînên dûr û dirêj zehmet bûye, xelk di rêzên dirêj de tên rawestandin û di wargehên xwendekaran ku dê mêvan lê bihatina ezimandin de tadîlat hatiye destpêkirin. Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku walîtiyê bajar veguherandiye qada Rewşa Awarte û di van şerd û mercan de mihrîcan nayê lidarxistin.

### Ji Saziya Îlan û Çapemeniyê, bo birgun.net.ê cezaya nişandera zêde

Saziya Îlan û Çapemeniyê ji bo nûçeya bi navê 'Li Dokuz Eylulê Hilweşîn' ku di 30'ê Tîrmeha 2021'an de li BirGün Egeyê hatiye weşandin 7 roj cezayê nîşandera zêde da birgun.net.ê.

Her çend nûçeya navborî bi qasî salek berê hatibe weşandin jî, di 6'ê Tîrmeha 2022'an de li gorî benda 129'an a Esasên Ehleqî yên Çapemeniyê biryar hat dayîn.

Saziya Îlan û Çapemeniyê, di lêkolîna xwe ya li dû giliyê Zanîngeha Dokuz Eylûlê de, daxuyanên di nûçeyê de cihgirtine wekî îsnadên neheq qebûl kir û cezayê pereyan birî. Hin ji van daxuyanan ev in: “Zanîngeha Dokuz Eylulê ku yek ji zanîngehên bi kokdar ên Tirkiyeyê ye, di salên dawî de ji serkeftinên xwe yên di perwerdehî û lêkolînê de bi dest xistine wêdetir, bi zextên li akademîsyen û xwendekaran tên kirin di rojevê de ye”, “Zanîngeha Dokuz Eylulê ku bi salan e li Herêma Ege û Tirkiyeyê di nav zanîngehên herî wesfdar de cih digire, ev 3 sal in bûye mijara nûçeyên ku tu eleqeya xwe bi jiyana akademîk re nîne”, “'Li Dokuz Eylulê hilweşîneke akademîk heye”.

Saziya Îlan û Çapemeniyê nîşandera zêde dide weşangerên ku li ser malper û hesabên xwe yên medyaya civakî îlanên sazîyê diweşînin. Rojnameya BirGünê dê 7 rojan nikaribe ji vê hatinê sûd wergire.

### 22ê Tîrmehê, 2022

### Di çalakiya Pirsûsê ya li Stenbolê de 106 kes hatin binçavkirin

Di sala heftemîn a Komkujiya Pirsûsê ya ku di 20'ê Tîrmeha 2015'an de 33 ciwanan di encama êrîşa bombeyî de jiyana xwe ji dest dabûn, polîsan mudaxeleyî bîranîna li Kadikoya Stenbolê kir.

Piştî daxuyaniya çapemeniyê ya li Kolana Halitagayê 106 kesên ku xwestin bimeşin hatin binçavkirin. Kesên binçavkirî birin Midûriyeta Emniyetê ya Stenbolê ya li ser Kolana Vatanê. Li wir, bi îdiaya

"dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan" îfadeyên wan hatin girtin. 16 kes, li gel îdiaya "dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan " bi " liberxwedana li hember polîsan" jî hatin sucdarkirin.

16 kes sewqî dozgeriyê hatin kirin, 90 kes jî hatin berdan. Piştî îfadeyên dozgeriyê 14 kes bi şerda kontrola edlî hatin berdan. 2 kes jî bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê hatin kirin.

### Rêziknameya Binçavkirinê, li gorî Qanûna Cezayê Muhakemeyê ji alîyê cihgirtina îfadeyên parêzeran hat guncandin.

Wezareta Dadê, di 'Rêziknameya Girtin, Binçavkirin û îfadestandinê' de guherîn pêk anî. Bi rêziknameya nû ya ku di hejmara îro ya Rojnameya Fermî de hat weşandin, îfadeyên parêzerên kesên hatine binçavkirin dê di girtenameyê de bên qeydkirin.

Guhertina rêziknameyê ji Teşkîlata Emnîyetê re wekî hişyarîyekê hat fehmkirin ku divê li gorî Qanûna Cezayê Muhakemeyê tevbigerin. Lewma, îfadeyên li rêziknameyê hat zêdekirin di Qanûna Cezayê de jî cih digirin, wekî: “Parêzer dikare hemû mafên bersûcan ên qanûnî bi bîra wan bixe. Daxuyanên parêzeran û her cure mudaxeleyên wan divê di girtenameyê bên qeydkirin. Ev rêzikname di roja weşandina wê de dikeve meriyetê. Xalên vê rêziknameyê ji aliyê Wezîrê Dadê ve tên îcrakirin”.

Bi taybetî, di pêvajoya binçavkirinên di çalakîyên civakî de cihnedana daxuyanên parêzeran a di girtenameyan de dibû mijara gilîyan. Wezareta Dadê bi vê guherîna rêziknameyê hebûna pêkanînên derqanûnî qebûl kir.

### Astengkirina nûçeyên der barê Emine Erdoğan de

Li ser daxwaza Emîne Erdogan a hevjîna Serokomar û Serokê Giştî yê AKPê Recep Tayyîp Erdogan, gihandina nûçeyên Serokatiya Ajansa Hawirdorê hat astengkirin. 2yemîn Dadweriya Cezaya Sulhê ya Anadoluyê ya Stenbolê jî gihandina nûçeyên der heq vê astengkirinê de asteng kirin.

Bi guherandinên ku di Qanûna Hawirdorê de hatin çêkirin ve, li seranserî peravên Tirkiyeyê, rayeya îhalekirina mapa û şamandirayan ket destê Ajansa Hawirdorê ya ku di hîmayeya Emîne Erdogan de hatiye avakirin. Nûçeyên astengkirî bi vê mijarê ve eleqedar bûn. Her wiha nûçeyên der barê astengkirinê de jî hatin astengkirin.

Emîne Erdogan bi rêya parêzerê xwe Ahmet Ozel re serî li 2yemîn Dadweriya Cezayê Sulhê ya Anadoluyê ya Stenbolê da. Di serîlêdanê de îdia kir ku di nûçeyên der heq astengkirinê de rûmeta wê hatiye pelçikîn û bi vî awayî mafên wê yên şexsî hatiye binpêkirin.

### 25ê Tîrmehê, 2022

### Di kantînên girtîgehan de bihayê gelek pêdiviyên bingehîn ji sedî 225 hat zêde kirin. Ji ber vê yekê girtî di peydakirina pêdiviyên bingehîn de zehmetiyan dikişînin."

Di kantînên girtîgehan de bihayê gelek pêdiviyên bingehîn sedî 225 hat zêde kirin. Di nava mehekê de bihayê kaxizên A4ê ku girtî ji bo nivîsandina nameyan bi kar tînin, sedî 225 zêde bû. Bihayê kaxezên A4ê ku 50 heb bi hev re tên firotin di meha Hezîranê de 4 TL bû û di meha tîrmehê de bû 13 TL. Penêrê Kaşarê ku di meha hezîranê da 36 lîre û 27 quruş bû bi lêzedekirineke sedî 75 derket 63 lîre û 50 quruşî.

Zêdebûna bihayê bikaranîna elektrîkê jî bandor li girtiyan kir. Ji ber ku girtîgeh di "statûya tîcaretxaneya yekcarî" de ne, bihayê elektrîka ku girtî bi kar tîne ji yên xaniyan bilindtir dibe.

Seroka Komeleya Mafên Mirovan a Şaxa Stenbolê Gulseren Yolerî, der barê mijarê de daxuyanî da û got, “Di vê rewşa ku girtî neçar in pêdivîyên xwe ji kantînan bikirin, bihakirina pêdivîyên bingehîn girtîyan tengezar dike. Ev zem nayên qebûlkirin. Pêwîstiyên girtîyan divê ji aliyê rêveberiyê ve bê pere bên dayîn."

## Der barê mamosteyên ku li ber tabelaya kurdî nivîsên nijadperest parvekirin de doz hat vekirin

4 mamoste li ber tabelaya ku di ketina navçeya Erziromê, Qereyazîyê ye û li ser bi kurdî û tirkî “Hûn bi xer hatin- Hoş geldiniz” nivîsîye nivîsên nîjadperest û rengheqaret parve kirine. Li ser vê yekê der barê mamosteyan de doz hat vekirin.

Li ser giliyê Baroya Amedê, Serdozgeriya Komarê ya Qereyaziyê der barê 4 mamosteyan de ji sûcê "ji ber cudahiyên çînî, nijadî, olî, mezhebî, zayendî an jî herêmî bi eşkereyî kêmxistina beşek ji gel" doznameyek amade kir. Dozname ji aliyê Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Qereyaziyê ve hat qebûlkirin. Rûniştina ewil a dozê dê di 8ê Mijdara 2022an de pêk bê.

## Der heq du pirtûkên Weşanxaneya Ceylanê biryara desteserkirinê

Midûriyeta Şûbeya Emniyetê ya Stenbolê der barê du pirtûkên Weşanxaneya Ceylanê yên bi navê "Şoreşa Jinê" û "Çûna Kobanê ji zimanê kesên li Pirsûsê mane" biryara desteserkirinê da.

Weşanên Ceylanê ragihand ku di 19'ê Tîrmehê de ango rojek beriya salvegera Komkujiya Pirsûsê biryara desteserkirinê ji aliyê dozgeriyê ve hatiye qebûlkirin.

Pirtûka bi navê " Çûna Kobanê ji zimanê kesên li Pirsûsê man" ji bo bîranîna 33 ciwanên di 20'ê Tîrmeha 2015'an de li navçeya Pirsûsê ya Rihayê di êrîşa bombeyî de jiyana xwe ji dest dabûn, hatibû amadekirin. Di vê êrîşê de êrîşkar jî di nav de 34 kes hatin kuştin û zêdetirî 100 kesan jî birîndar bûn. Kesên ku bûn hedefa êrîşê, li ser banga Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst (SGDF) pêlîstok û malzemeyên alîkariyê yên mirovahî dibirin Kobanê. Kobanê ku bajaroka Kurdan a li Bakurê Sûriyeyê ye, di sala 2014’an de ji aliyê çeteyên DAIŞê ve hatibû dorpêçkirin û dagirkirin. Kobanê di Adara 2015’an de ji aliyê hêzên Kurdî ve ji destê DAIŞê hatibû rizgarkirin.

## 28ê Tîrmehê, 2022

## Biryara Dadgeha Makezagonê: Dersa olî ya mecbûrî binpêkirina mafan e

Li ser serîlêdana Huseyîn El û keça wî Nazlî Şîrîn El, Dadgeha Makezagonê pêkanîna dersa mecbûrî ya olî vekola.

Dadgehê bi biryara xwe ya 28’ê Tîrmeha 2022an ragihand ku bi pêkanîna dersên olî yên mecbûrî re mafê dê û bavan a daxwaza rêzgirtina ji baweriyên wan ên di perwerdehî û hîndekariyê tê binpêkirin.

Huseyîn El di sala 2009'an de ji bo keça wî ya li Dibistana Seretayî ya Havacilarê ya Eskîşehîrê dixwend ji dersên olî bê muafgirtin serî li midûriyetê da. Daxwaza wî bi hinceta “tenê kêmnetewe dikarin bên muafgirtin” hat redkirin.

Li ser vê yekê Huseyîn El peyva “Îslam” ji nasnameyên xwe da derxistin û li dijî wezaret û walîtiyê doz vekir. Di pêvajoya darazê de biryara dadgeha îdarî ya di lehê malbatê de hatibû dayîn ji teref Şûraya Dewletê ve hat betalkirin.

Di vê pêvajoyê de Nazli El ji ber ku di dersa olê de bi ser neket, di polê de ma û karneye wê nehat dayîn. Ji ber ku beşdarî dersa olê nebû ji dibistan û derdora xwe ve rastî zextan hat û neçar ma dibistanê biguherîne. Di qonaxa dawî de jî malbatê bi awayekî ferdî serî li Dadgeha Makezagonê da.

Dadgeha Bilind di dawiya lêkolîna xwe de biryar da ku bi pêkanîna dersên olî yên mecbûrî re mafê dê û bavan a daxwaza rêzgirtina ji baweriyên wan ên di perwerde û hîndekariyê tê binpêkirin.

Dadgehê di hinceta xwe de got, "Di dewleteke laîk de perwerde û hîndekariya oleke taybet nayê ferzkirin." Dadgehê her wiha biryar da ku ji bo zirara manewî 20 hezar TL bê dayîn.

Dema ew binpêkirina mafî pêk hat Nazli Şîrîn El di dibistana seretayî de xwendekara pola 4'emîn bû û dema ew derbasî sala dawî ya zanîngehê bû ev biryar derket.

### 29ê Tîrmehê, 2022

### Parêzerê Erdogan daxwaz kir, gihîştina 130 nûçeyan hat astengkirin

Serokê Giştî yê AKP'ê û Serokkomar Erdogan gihîştina 130 nûçe û weşanên der barê parêzerê xwe yê berê Mustafa Dogan Înal de da astengkirin.

Di encama serîlêdana Înal de biryar ji aliyê 3yemîn Dadweriya Cezayê Sulhê ya Anadoluyê ve hat dayîn. Înal îdia kir ku nûçe, bê delil, bi mebesta binpêkirina mafên şexsî hatiye çêkirin. Lê belê dadgehê ji weşangerên pêwendîdar nepirsî ka delîlên wan hene yan na.

Di nûçeyên sansurkirî de hatibû îdiakirin ku Mustafa Dogan Înal li ser bertîlê muzakere kiriye.

Di van nûçeyan de ku Înal gihîştina wan astengkir, firotina hiseyên Simit Sarayiyê, îdiayên bertîlxwarinê yên di dema rizgarkirina TEFALê de, jê kişandina wî ya ji wezîfeya wî ya li Şaredarîya Mezin a Stenbolê ku 15 milyon lîre wekalet standibû, daxuyanîyên Wekîlê CHPyê yê Mêrsînê Alî Mahir Başarir jî cih digirtin. Her wiha di nav nûçeyan de daxuyanîya Serokê Giştî yê CHPyê Kemal Kılıçdaroglu ku gotibû "Em ê razanên çeteya pêncan malhemû bikin." jî cih digirt.

Li gorî rapora Komeleya Azadiya Derbirînê ya bi sernavê 'Fahrenheit 5651: Bandora Sansûrê ya Şewatbar' tevî 58 hezar û 809 malper û navperên ku di nav sala 2020an de gihîştina wan hatine astengkirin, di dawîya sala 2020an de ji Tirkiyeyê gihîştina 467 hezar û 11 malper û navperan hatine asteng kirin.

Ev biryar di çarçoveya qanûna jimare 5651î ku 14 sal berê ket meriyetê tê dayîn. Qanûn der barê Birêkûpêkkirina Weşanên li ser Înternetê û Têkoşîna bi Sûcên bi Rêya Van Weşanan Tê Kirin de ye.

(çavkanî: https://ifade.org.tr/reports/EngelliWeb_2020.pdf)

### Biryara Dadgeha Makezagonê: Çalakiya "Yek Mirovî" azadiya ramanê ye

Der heq dosyaya ku cezayê pereyê li Nursel Tanriverdi ya ku bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de ji kar hatibû bidûrxistin ji ber çalakiya wê ya "Ez karê xwe dixwazim" hat birîn, Dadgeha Makezagonê (AYM) biryara îhlalkirina azadiya ramanê da.

Dadgehê biryar da ku bi cezadayîna Tanrıverdiyê azadîya wê ya derbirînê hatiye binpêkirin. Ji bo her çalakiyeke wê ya rûniştinê ku di Sibat û Adara 2020an de pêk anîbûn, 392 lîre cezayê pereyê li Tanrıverdiyê hatibû birîn. Dadgehê diyar kir ku biryara qedexeyê bi hinceta "parastina nîzama gelemperiyê" hatiye girtin, lê belê keseke ku bi tena serê xwe li qadê rûdine, nikare aramiya gel xera bike.

Dosya ji bo safîkirina encamên binpêkirina azadiya derbirînê, ji 7emîn Dadweriya Cezayê Sulhê ya Bakirkoyê re hat şandin da ku darizandin ji nû ve bê kirin.

Nursel Tanriverdi bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de ya jimare 686an a 7ê Sibata 2017an de ji peywira xwe hat bidûrxistin. Li dijî bêhiqûqiya biryara bidûrxistinê di 20ê Sibata 2017an de li Qada Azadiyê ya Bakirkoyê dest bi çalakiya rûniştinê kir.

### Li Şirnexê qetlîama daristanê ya bi hinceta "ewlehiyê" tê kirin, hat protestokirin.

Li herêmên Besta, Cûdî û Gabarê yên Şirnexê, zêdeyî 2 salan e di bin çavdêriya leşkeran de cerdevan bi hinceta ewlehiyê daran dibirin. Di çalakîyên ku li Stenbolê li Îskeleya Kadikoyê û li Îzmîrê li ber Navenda Çandê ya Turkan Saylanê hatin lidarxistin de, banga têkoşîna hevpar a li dijî birîna daran hate kirin.

Komîsyona Hawirdor û Bajarvaniyê ya Baroya Şirnexê der barê birîna daran de raporek amade kir. Hevberdevkê Komîsyonê Fadil Tay di 13ê Tîrmeha 2022an de daxuyaniyek da çapemeniyê û agahîyên raporê bi raya giştî re parve kir. Li gorî raporê, di nava 7 mehên dawî de %7ê qadên daristanî yên Şirnexê hatine wêrankirin. Darên hatine birîn bi kamyonên 20-25 tonî ji ser navçeya Cizîrê ji bihayê bazarê pir kêmtir tê firotin û  tê şandin bo parêzgehên Qeyserî, Dîlok û Osmaniyeyê. Di meha tîrmehê de li 14 herêman birîna daran dest pê kir. Baroya Şirnexê bi hinceta îhale ya derusulî û rûxandina daristanan a bê hiqûqî danezana sûcê kir, lê belê tu lêpirsîn nehat kirin.

### 30ê Tîrmehê, 2022

### Li Enqereyê êrîşa li ser sê cemxaneyan

Li Enqereyê di 30ê Tîrmehê de roja Şemiyê êrîş li 3 cemxaneyan hat kirin. Navenda Weqfa Elewiyên Bektaşî yên Tirkmen a li navçeya Çankayayê, Cemxaneya Şah-i Merdan û Cemxaneya Ana Fatma yên li navçeya Mamakê bûn hedefa êrîşan.

Pîrê Cemxaneya Şah-i Merdan Kazim Erbektaş bal kişand ser vê yekê ku ev êrîş di roja destpêka meha Muharremê pêk hat ku ji bo Elewiyan destpêka rojên pîroz e.

Li gorî baweriya Elewiyan roja 10emîn a Muheremê ew roj e ku neviyê Hezretî Mihemed Husên û 72 endamên malbata wî li Kerbelayê ji aliyê Yezîdê kurê Muaviye yê ku xwedî dewlet û artêşa herî bihêz a wê demê bû, hatin kuştin. Muherrem meha yekem a salnameya Hicrî ye. Elewî bawer dikin ku ji pêxemberê yekem Adem û vir ve hemû pêxemberan rojî girtine. Elewî ji ber Kerbelayê vê rojîyê wekî rojîya şîna Muheremê ya 12 rojî digirin.

Li gorî daxuyanîya Midûriyeta Emniyetê ya Enqereyê hat tesbîtkirin ku di 31ê Tîrmehê de heman kesî her sê êrîş pêk aniye û hatiye binçavkirin.

Funded by
the European Union

This publication was produced with the financial support of the European Union. Its contents are the sole responsibility of EMR, İHD & (h)Ca and do not necessarily reflect the views of the European Union.